

ŞEHİR VE DİL

Diyarbakır'ın Edebi Mirası

ZİMAN-Û BAJAR

Mîrasa Edebî ya Diyarbekîrê

Editörler

Ali Karakaş

Abdusselam Ertekin



ENSAR NEŞRİYAT TİC. A.Ş.

© Eserin her türlü basım hakkı anlaşmalı olarak Ensar Neşriyat'a aittir.

ISBN: 978-

Sertifika No: 50201

Kitabın Adı

Diyarbakır'ın Gelecek Tasavvuru

Şehir ve Dil

Diyarbakır'ın Edebi Mirası

Zıman-û Bajar

Mirasa Edebi ya Diyarbakırê

Editörler

Ali KARAKAŞ

Abdusselam ERTEKİN

Yayın Yönetmeni

Hüseyin KADER

Adem SAYDAN

Kapak

Halil YILMAZ

Baskı-Cilt

ÇINAR MAT. ve YAY. SAN. TİC. LTD. ŞTİ.

100. Yıl Mahallesi Matbaacılar Caddesi

Ata Han No:34 / 5 Bağcılar - İSTANBUL

Tel: 0212 628 96 00 - Faks: 0212 430 83 35

Sertifika No: 45103

1. Basım

Temmuz 2024

İletişim

Ensar Neşriyat Tic. A.Ş.

Düğmeciler Mah. Karasüleyman Tekke Sok. No: 7 Eyüpsultan / İstanbul

Tel: (0212) 491 19 03 - 04 Faks: (0212) 438 42 04

www.ensarnesriyat.com.tr siparis@ensarnesriyat.com.tr

İÇİNDEKİLER

TAKDİM.....	9
TAKDİM.....	11
ÖN SÖZ.....	13
EDEBÎYATA KURDÎ YA KLASİK Lİ DÎYARBEKİRA SERDEMA OSMANÎ: REWŞA GIŞTÎ Û POTANSİYELA SOSYOLOJİK 13	
<i>Abdurrahman ADAK</i>	
ŞÊX MUHEMED KERBELA Û DÎWANA KERBELAÎ	49
<i>Yakup AYKAÇ</i>	
ŞÊX MUHEMMED ESKERÎ Û GEŞTEK Lİ NAV KEŞKOLA WÎ.....	81
<i>M. Zahir ERTEKİN</i>	
MEWLUDÊN ŞÊX MUHAMMED EMÎNÊ HEYDERÎ Û ÇANDA MEWLÎDÊ DI DÎYARBEKİR DE	141
<i>Hacı ÖNEN</i>	
FİQHNAMEYEKE MENZÛM Lİ SER MEZHEBÊ İMAMÊ ŞAFİ'Î: DELAÎLU'S-SALAT A MELE MUHEMMED SEÎDÊ TAXİKÎ.....	153
<i>Hayrullah ACAR</i>	
MELLE MEHDÎ OKÇU (LÎCEWÎ) Û KESAYETÎYA WÎ YA İLMÎ	201
<i>Osman ASLANOĞLU</i>	
DÎYARBEKİR, SEY MAHFÎLÊKO EDEBÎ: EDEBÎYATÊ ZAZAKÎ DE TESÎRÊ EDİBANÊ DÎYARBEKİRİJAN.....	221
<i>Ahmet KIRKAN</i>	
DEWA ÇÊRMÛGE AXIRMAT RA NİMÛNEYÊ SANIKANÊ ZAZAKÎ.....	239
<i>Kafur SEÇİLMEK</i>	
SERPÊHATÎYA MALBATA ZAL Lİ GOR VARYANTÊN DÎYARBEKİRÊ	265
<i>Hayreddin KIZIL</i>	

AYENDEYA ÇANDA DENG BÊJÎYÊ DI ÎNŞAYA MÎRATEYA ÇANDÎ Û DÎROKÎ YA DÎYARBEKİRÊ DE	285
---	-----

Ayhan YILDIZ

PÎRSGİRÊKA WERGERA PEYVA “UMMÎ”YÊ DÎ MEALA FÎKRÎ AMEDÎ DA YA BÎ NAVÊ “QUR’ANA KERÎM Û MEALA WÊ YA KURDÎ”	329
---	-----

Haşim ÖZDAŞ

BEŞDARÎYA KESAYETÎYÊN LICEYÊ DI GEŞEDANA ÇANDA KURDÎ DA.....	341
--	-----

Zülküf ERGÜN

PÎRSGÎRÊKA WERGERA PEYVA “UMMÎ”YÊ DÎ MEALA FÎKRÎ AMEDÎ DA YA BÎ NAVÊ “QUR’ANA KERÎM Û MEALA WÊ YA KURDÎ”

Haşim ÖZDAŞ*

DESTPÊK

Peyva “umm”ê ji koka “e-m-m”ê (م-م-م) hatîye dariştin ku tê maneya çavkanî, cihê vegerê,¹ qesdkirinê² û koka tiştêkî.³ Herweha ev peyv ji bo wî tiştî tê gotin ku çavkanî yan jî destpêka tiştêkî din e, wî mezin an jî îslah dike.⁴ Ji ber vê yekê ye ku ev peyv di zimanê erebî da ji bo wî tiştî tê gotin ku tiştên din li dora wî dicivin.⁵ Ji ber ku hemû endamên bedena însan pê ve girêdayî ne, ji “mêjî” yan jî perdeya li ser mêjîyê “ummu’r-re’s” (أُمُّ الرَّأْسِ) tê gotin.⁶ Mîna vê, ji ber ku stêrk lê dihêwirin terkîba “ummu’n-nucûm” (أُمُّ النُّجُومِ) bi maneya “galaksî”⁷ û “esman” tê bikaranîn.⁸ Herweha ji ber ku li pêş e û endamên civakê li dora wî kom dibin ji serokê civakê ra “umm” tê gotin.⁹ Ji xeynî vê, ji ber ku dibe sedem ji bo hemû pîsîftîyan, terkîba “ummu’l-xebais” (أُمُّ الْخَبَائِثِ) ji bo “mey”ê tê bikaranîn.¹⁰ Mîna vê, ji bo rêya mezin

* Doç. Dr., Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi, hasimozdas@gmail.com Orcid: 0000-0002-4621-435X.

1 İbn Faris, *Mu’cemu Meqayisi’l-Luxe*, thq. ‘Ebdusselam Muhemmed Harûn, Daru’l-Fikir, 1979, 1/21.

2 Xelîl bin Ehmed el-Ferahîdî, *Kitabu’l-‘Eyn*, thq. ‘Ebdulhemîd Hindawî, Daru’l-Kutubi’l-İlmîyye, Beyrût 2003, 1/89; İbn Dureyd, *Cemheretu’l-Luxe*, thq. Remzî Munîr Be’lebekkî, Daru’l-‘İlmi li’l-Melayîn, Beyrût 1987, 1/59; Ebû Mensûr Muhemmed bin Ehmed el-Ezherî, *Tehzibu’l-Luxe*, thq. Ebdulhelîm en-Neccar, ed-Daru’l-Misriyye li’l-Te’lîf we’t-Terceme, Qahire 1964, 15/640.

3 Ezherî, *Tehzibu’l-Luxe*, 6/475.

4 Raxib el-İsfahanî, *el-Mufredat fi Xeribi’l-Qur’an*, thq. Muhemmed Seyyid Keylanî, Daru’l-Me’rîfe Beyrût, 22.

5 Xelîl bin Ehmed, *Kitabu’l-‘Eyn*, 1/87; Sahib b. ‘Ebbad, *el-Muhît fi’l-Luxe*, thq. Muhemmed Hesên Al Yasîn, ‘Alema’l-Kutub, Beyrût 1994, 10/458; İbn Faris, *Mu’cemu Meqayisi’l-Luxe*, 1/22.

6 İbn Dureyd, *Cemheretu’l-Luxe*, 1/59-60; Ezherî, *Tehzibu’l-Luxe*, 15/633.

7 İbn Dureyd, *Cemheretu’l-Luxe*, 1/60; Ezherî, *Tehzibu’l-Luxe*, 15/633; İbn Faris, *Mu’cemu Meqayisi’l-Luxe*, 1/22.

8 İbn Dureyd, *Cemheretu’l-Luxe*, 1/60; İbn Faris, *Mu’cemu Meqayisi’l-Luxe*, 1/24.

9 Sahib b. ‘Ebbad, *el-Muhît fi’l-Luxe*, 10/458.

10 Ezherî, *Tehzibu’l-Luxe*, 15/632.

a ku li dora wê, rêyên biçûk hene, bi maneya rêya sereke terkîba “umm’t-terîq” (أُمُّ الطَّرِيقِ) tê bikaranîn.¹¹ Herweha her bajar, ji bo gund û bajarokên li derdora xwe “umm” e. Bi vê maneyê ji Mekkeyê ra “ummu’l-qura” hatîye gotin.¹² Ji ber ku destpêka kitêbê ye ji sûreyê ewil ê Qur’ana Pîroz ra¹³ an jî ji ber ku hemû zanîn bi bal wê ve tên nisbetkirin û jê derdikevin ji lewhî mehfûzê ra “ummu’l-kitab” (أُمُّ الْكِتَابِ) hatîye gotin.¹⁴ Lewra hemû zanîn bi bal wê ve tên nisbetkirin û jê derdikevin.¹⁵ Li alîyê din ev peyv, çî ji bo însanan çî jî ji bo heywanan tê maneya “dayik”ê jî. Lê belê hin ferhengzan dibêjin ku pirhejmara vê peyvê ji bo însanan bi awayê “ummehat”ê, ji bo heywanan wekî “ummat”ê ye. Anku ji bo nîşandayîna ferqa di navbera dayikên ji însan û yên heywanan da herfa “he”yê (هـ) di pirhejmara ji bo heywanan tê hezifkirin.¹⁶

Li alîyê din tê gotin ku peyva “ummî”yê ya ku bi bal kelîmeya “umm”ê ve hatîye nisbetkirin tê maneya kesê ku hînî xwendin û nivîsandinê nebûye.¹⁷ Lewra nivîsandin karekî kesbî ye. Gava meriv hînî nivîsandinê nebûbe, ev tê wê maneyê ku meriv çawa hatibe dinyayê, wisa maye. Herweha ev peyv ji bo kesê kêmfam, zimanxerab û xeberreq tê bikaranîn. Dîsa tê gotin ji ber ku civaka ereban bi piranî xwendin û nivîsandin nedizanîn ji civaka ereban ra¹⁸ an jî ji ber ku ji bajarê Mekkeyê ye ji Muhammed aleyhiselam ra “ummî” hatîye gotin.¹⁹

Berî ku em li mijara xwe hûr bibin, em dixwazin bi çend gotinan behsa wergêr û xebata wî bikin. Fikrî Amedî (Bozkurt) di sala 1971ê da li gundê Xeltûşka hatîye dinyayê. Ev gund, bi navçeya Erxenîyê ve girêdayî ye. Xwendina xwe ya seretayî li navçeya Bismilê, ya navîn û amadehiyê li Amedê kuta kirîye. Di sala 1997an da li zanîngeha Dîcleyê fakulteya perwerdeyê dest bi xwendinê kirîye û di sala 1997an da temam kirîye. Ji xeynî wergera wî ya Qur’ana Pîroz hin helbest û wergerên wî yên kurdî hene. Wergêr niha li Amedê dijî. Amedî di sala 1996an da hîn gava li zanîgehê xwendekar bûye, dest bi wergera Qur’anê kirîye û di sala 2009an da temam kirîye. Ji ber hin sedeman, çapa vê xebatê bi derengî ketîye û

11 Ezherî, *Tehzîbu’l-Luxe*, 15/632; Îbn Faris, *Mu’cemu Meqayîsi’l-Luxe*, 1/25.

12 Xelîl bin Ehmed, *Kitabu’l-’Eyn*, 1/87; Îbn Dureyd, *Cemheretu’l-Luxe*, 1/59; Ezherî, *Tehzîbu’l-Luxe*, 15/631; Sahib b. ‘Ebbad, *el-Muhît fi’l-Luxe*, 10/459.

13 Raxib el-Îsfahanî, *el-Mufredat*, 23. Herweha bnr: X Xelîl bin Ehmed, *Kitabu’l-’Eyn*, 1/87; Îbn Dureyd, *Cemheretu’l-Luxe*, 1/59; Ezherî, *Tehzîbu’l-Luxe*, 15/632.

14 Raxib el-Îsfahanî, *el-Mufredat*, 23. Herweha bnr: Sahib b. ‘Ebbad, *el-Muhît fi’l-Luxe*, 10/459; Îbn Faris, *Mu’cemu Meqayîsi’l-Luxe*, 1/23.

15 Raxib el-Îsfahanî, *el-Mufredat*, 22.

16 Ezherî, *Tehzîbu’l-Luxe*, 15/630-631.

17 Sahib b. ‘Ebbad, *el-Muhît fi’l-Luxe*, 10/459; Îbn Faris, *Mu’cemu Meqayîsi’l-Luxe*, 1/28.

18 Ezherî, *Tehzîbu’l-Luxe*, 15/636-637.

19 Raxib el-Îsfahanî, *el-Mufredat*, 24.

encax di 2014an ji nav weşanên Ensarê derketîye. Ji ber ku wergêr bi zimanê erebî nedizanî xebata xwe bi îstifadeya ji tefsîr û mealên turkî amade kirîye.²⁰

Peyva “ummî”yê di Qur’ana Pîroz de şeş caran hatîye bikaranîn. Du caran wekî wesfê Pêxemberê me aleyhiselam bi qalibê yekhejmarîyê “el-ummî” (الْأُمِّيَّ)، çar caran jî bi qalibê pirhejmarîyê mîna “ummîyûne” (الْأُمِّيُّونَ) û “el-ummîyîne”yê (الْأُمِّيَّيْنَ) derbas dibe. Di kitêbên tefsîrê da qalibê yekhejmarî ya vê peyvê bi piranî wekî kesê ku hînî xwendin û nivîsandinê nebûye; qalibê pirhejmarîyê jî zêdetir wekî ereban, erebên muşrik tê manekirin. Di wergera Qur’anê ya bi navê “Qur’ana Kerîm û Meala wê ya Kurdî” ya ku ji alîyê Fikrî Amedî ve hatîye amadekirin kelîme di vê çarçoveyê da hatîye wergerandin. Bi bawerîya me wergerandina kelîmeyê bi vî rengî, pîrsgîrêk e. Di vê xebatê em dê li ser pîrsgîrêka wergera vê kelîmeyê bisekinin. Paşê jî alternatîfa ku em rast qebûl dikin dê pêşniyaz bikin.

Mînaka Ewîl: Beqere 2/78

(وَمِنْهُمْ أُمِّيُونَ لَا يَعْلَمُونَ الْكِتَابَ إِلَّا أَمَانِيٍّ وَإِنْ هُمْ إِلَّا يَظُنُّونَ)

Ev ayet, di wergera bi navê “Qur’ana Kerîm û Meala wê ya Kurdî” ya ku ji alîyê Fikrî Amedî ve hatîye amadekirin, weha hatîye wergerandin: “*Qismek ji wan ummî (ne xwende) ne ku bi kitêbê (Tewrat) nizanin. Tiştên pê dizanin jî, tev xeyal û guman in. Ew tenê li dû gumanê ne.*”²¹

Çawa ku tê dîtin Amedî, peyva “ummîyûne”yê wekî “ummî ne” û di nav kevanekê da jî bi awayê “ne xwende” wergerandîye.

Ji peywendîya ayetê tê famkirin ku li vir behsa komeke ji cihûyan tê kirin. Lewma cumhûrê mufesiran ev peyv bi awayê wan cihûyên ku nexwenda ne, mane kirine. Li gor vê maneyê ji ber ku kesên navborî nikarin Tewratê bixwînin, ji xeynî tiştên ku alimên wan ji wan ra dibêjin ji Tewratê tişteki nizanin. Anku zanîna wan a di heqê Tewratê da -çi rast çi derew- ji wan tiştan pêk tê ku ji alimên xwe bihistine.²² Mufesîrê bi nav û deng Teberî (w. 310/923) dibêje ku ev kelîme bi bal peyva “umm”ê anku “dayik”ê ve hatîye nisbetkirin û tê maneya kesê ku nikare bixwîne û binivîse. Lewra di nav civaka ereban da xwendin û nivîsandin di nav mêran da berbelav bû, ji ber vê yekê gava ji mêran xwendin û nivîsandina yekî nebûye, ji

20 Mehmet Tahir Pekim, *Kürtçe Tefsir ve Meâl Çalışmaları (Nûra Qelban Örneği)*, ed. Lokman Şan, Weşanên Fecrê, Stenbol 2023, 208-209.

21 *Qur’ana Kerîm û Meala wê ya Kurdî*, wergêr: Fikrî Amedî, Weşanên Ensar Neşriyat, Stenbol 2014.

22 Muqatîl b. Suleyman, *Tefsîru Muqatîl*, thq. ‘Ebdullah Mehmûd Şehhate, Muesseset’t-Tarîxi’l-‘Erebî, Beyrût 2002, 1/118; Ebû Ce’fer Muhemmed bin Cerîr et-Teberî, *Cami’u’l-Beyan ‘en Te’wîli Ayi’l-Qur’an*, thq. ‘Ebdullah bin ‘Ebdulmuhsin et-Turkî, Merkezu’l-Buhûs we’l-Dirasati’l-‘Erebîyye we’l-İslamîyye Daru Hecc, Qahire 2001, 2/153, 162-163; Maturîdî, *Te’wilatu’l-Qur’an*, thq. Ahmet Vanlıoğlu - Bekir Topaloğlu, Mizan Yayınevi İstanbul 2010, 1/164.

alîyê nezanîna bi nivîsandinê ew bi bal dayika wî ve nisbet dikirin.²³ Meriv dikare li van gotinan weha îtiraz bike: Ji bo ku kelîme weha bê manekirin, divê di peyva “umm”ê da maneyeke weha hebe. Lê belê di ferhengan da ji bo peyva “umm”ê maneyeke weha nehatîye dayîn.²⁴

Li alîyê din li gor Îbn Quteybe (w. 276/889) kesên ku li vir behsa wan tê kirin, Tewratê dixwînin, lê belê bi naveroka wê nizanin. Rewşa van kesan nabe mîna yên ku bi naveroka kitêbê dizanin.²⁵ Mufesir û zimannas Zeccac (w. 311/923), di şiroveya vê kelîmeyê da weha dibêje: Ev kes, bêtî ku têbigihîjin kitêbê dixwînin.²⁶ Mufesirê bi nav û deng Zemexşerî (w. 538/1144) jî kelîme di vê çarçoveyê da îzah kirîye.²⁷ Bi rastî jî peyva “emanîyy”ê (أَمَانِيّ) ya ku pirhejmara peyva “umniyye”yê jî nîşan dide ku ew kitêbê dixwînin, lê jê fam nakin. Xwendineke bi vî rengî di merivan da dibe sedema bendewarîyên xeyalî. Lewma mufesirê kurd Îbn Teymîyye (w. 728/1328) weha dibêje: Kesên ku li vir behsa wan tê kirin, kitêbê dixwînin, lê belê jê fam nakin an jî tam ne hakimê naveroka wê ne.²⁸

Di çarçoveya van agahîyan da bi bawerîya me mîna vê wergera li jêr, divê ku meriv vê kelîmeyê bi awayê “ummî”yê binivîse, paşê jî wê li jêrenotê îzah bike: “*Hinek ji wan ummî ne; kitêbê nizanin, zanîna wan a di heqê wê da bi tenê texmînên bêbingeh in. Ew, bi tenê bi zena xwe xeber didin.*”

Mînaka Duduyan: Alî Îmran 3/20

(فَإِنْ حَاجُّوكَ فَقُلْ أَسْلَمْتُ وَخَيَّرْتُ لِلَّهِ وَمَنِ ابْتَعَنَ وَقُلْ لِلَّذِينَ أُوتُوا الْكِتَابَ وَالْأَعْيُنَ أَسْلَمْتُمْ فَإِنْ أَسْلَمُوا فَقَدِ اهْتَدَوْا وَإِنْ تَوَلَّوْا فَإِنَّمَا عَلَيْكَ الْبَلَاءُ وَاللَّهُ بَصِيرٌ بِالْعِبَادِ)

Ev ayet di meala navborî da weha hatîye wergerandin: “(Ya Muhemmed) *ger bi te re ketin munaqeqê (Ji wan re) bibêje: ‘Ez û yên li pey min; em teslîm bûne.’ Ji yên kitêb ji wan re hatine û muşrikên nexwende re bibêje: ‘Ma hûn jî (ji Xwedê re) teslîm bûne yan na?’ Eger teslîm bibin (û bikevin Îslamê) bêguman wan rêya rast dîtine. Lê eger rû bizivirînin; li ser te, hew teblîxkirin heye. Xwedê bendeyan dibîne.*”

23 Teberî, *Cami’u’l-Beyan*, 2/154.

24 Bnr. Xelîl bin Ehmed, *Kitabu’l-‘Eyn*, 1/89; Îbn Dureyd, *Cemheretu’l-Luxe*, 1/59; Ezherî, *Tehzîbu’l-Luxe*, 15/640; Îbn Faris, *Mu’cemu Meqayîsi’l-Luxe*, 1/21; Raxib el-Îsfahanî, *el-Mufredat*, 22.

25 Îbn Quteybe, *Tefsîru Xerîbi’l-Qur’an*, thq. es-Seyyid Ehmed Seqer, Daru’l-Kutubi’l-‘İlmîyye, Beyrût 1389/1978, 56.

26 Ebû Îshaq Îbrahîm es-Serî ez-Zeccac, *Me’ani’l-Qur’an we Î’rabuhu*, thq. ‘Ebdulcelîl ‘Ebduh Şelebî, ‘Ale-mu’l-Kutub, Beyrût 1988, 1/159.

27 Mehmûd bin ‘Umer ez-Zemexşerî, *el-Keşşaf ‘en Heqaiqi Xewamidi’t-Tenzîl we ‘Uyûnu’l-Eqawîl fî Wu-cûhi’t-Te’wîl*, thq. eş-Şeyx ‘Adîl Ehmed Ebdulmewcûd - eş-Şeyh ‘Elî Muhemmed Mu’ewwed, Mektebetu’l-‘Ubeykan, Rîyad 1998, 1/288.

28 Îbn Teymîyye Ebû’l-‘Ebbas Teqîyuddîn Ehmed b. ‘Ebdulhelîm el-Herranî, *Deqaiqu’t-Tefsîr*, Muessesetu ‘Ulûmî’l-Qur’an, Dimeşq 1404/1984, 1/225.

Di heqê maneya vê peyvê da ji Îbn Ebbas (w. 68/687-88) du rîwayet hatine neqilkirin. Li gor rîwayetekê, wî ev peyv bi awayê “kesên nexwenda”,²⁹ li gor rîwayeteke din jî bi awayê “muşrikên ereb” şirove kirîye.³⁰ Îbn Quteybe wekî “ereban”,³¹ Zeccac jî mîna “muşrikên ereb” tefsîr kirîye.³²

Li alîyê din Ebû ‘Ubeyde (w. 209/824) ev peyv weha tefsîr kirîye: Ew kesên ku pêxember ji wan ra bi kitêban nehatine şandin.³³ Gelek mufesirên din jî gotine ku ev peyv, bi maneya wan ereban e ku li ber destê wan kitêbeke îlahî tune ye. Ji ber vê yekê ji xwendina wê mehrûm in.³⁴ Bi gotineke din li vir behsa wan kesan tê kirin ku kitêbeke îlahî ji wan ra nehatîye hinartin. Lewra dema Qur’an daket, li ber destê civaka Mekkeyê ya wê heyamê, kitêbeke îlahî tune bû, loma jê ra “ummî” dihat gotin. Anku ev peyv çî ereb çî ne ereb, herweha çî xwenda çî jî nexwenda hemû kes û civakan îfade dike ku li ber destê wan kitêbeke îlahî tune ye.³⁵ Ha ereb jî ji vî alîyê ve dibin “ummî”, ne ji ber ku nexwenda ne. Bi kurtasî bi bawerîya me divê ku meriv vê ayetê weha wergerîne: “*Heke bi te ra bikevin nîqaşê, bibêje: “Ez teslîmî Xwedê bûm; ên li pey min tên jî!” Ji wan kesên ku kitêb ji wan ra hatîye dayîn û ji ummîyan ra (ji bo wan kesên ku kitêbeke wan a îlahî tune ye), bibêje: “Gelo hûn jî teslîm bûn?” Heke teslîm bibin, êdî hatine ser rêya rast; lê heke rû badin, ya li te dikeve bi tenê teblîxa ayetan e. Xwedê, evdên xwe her dem dibîne.”*

Mînaka Sisêyan: Alî Îmran 3/75

(وَمِنْ أَهْلِ الْكِتَابِ مَنْ إِنْ تَأْمَنَهُ بِقِطَارٍ يُودِّهِ إِلَيْكَ وَمِنْهُمْ مَنْ إِنْ تَأْمَنَهُ بَدِينَارٍ لَا يُؤَدِّهِ إِلَيْكَ إِلَّا مَا دُمْتَ عَلَيْهِ قَائِمًا ذَلِكَ بِأَنَّهُمْ قَالُوا لَيْسَ عَلَيْنَا فِي الْأُمِّيِّينَ سَبِيلٌ وَيُثْبِتُونَ عَلَى اللَّهِ الْكَذِبَ وَهُمْ يَعْلَمُونَ)

Ji Ehlê Kitab hin kesan xwarina malên misilmanan bi neheqî ji xwe ra helal qebûl dikirin. Bi bawerîya wan xwarina malên cihûyan bi neheqî heram e, lê belê yên ne cihû bin helal e. Ji îfadeyên di dawîya ayetê da tê famkirin ku ev gotin bêbextî ne. Anku çî cihû bin çî jî ne cihû bin xwarina malên hemû kesan bi rêyên neqeh heram e.³⁶ Ev bawerî di çavkanîyên cihûyan da yên bi navê Tosefta, Telmûda Qudsê û Telmûda Babîlê da derbas dibe. Lê belê tê gotin ku Rabban Gamliel ev hikmê han ji holê rakirîye. Lewra ev yek dibe sedem ku dînê Xwedê ji alîyê însanan ve

29 Teberî, *Cami ‘u’l-Beyan*, 5/288.

30 Ebu’l-Hesen ‘Elî b. Muhammed b. Hebib el-Besrî el-Mawerdî, *en-Nuket we’l-‘Uyûn*, thq. Seyyid b. ‘Ebdulmeqsûd b. ‘Ebdurrehîm, Daru’l-Kutubi’l-‘Îlmîyye - Muessesetu’l-Kutubi’s-Seqafîyye Beyrût, 1/380.

31 Îbn Quteybe, *Tefsîru Xerîbî’l-Qur’an*, 106.

32 Zeccac, *Me’ani’l-Qur’an*, 1/390.

33 Ebû ‘Ubeyde, *Mecazu’l-Qur’an*, thq. Fuat Sezgin, Mektebetu’l-Xancî, Qahire, 1/90.

34 Teberî, *Cami ‘u’l-Beyan*, 5/286; Maturîdî, *Te’wilatu’l-Qur’an*, 2/271; Zemexşerî, *el-Keşşaf*, 1/288.

35 Îbn Teymîyye, *Deqaiqu’t-Tefsîr*, 1/337.

36 Maturîdî, *Te’wilatu’l-Qur’an*, 2/342.

xerab bê dîtin. Dikare bê gotin ku kesên ev yek helal didîtin li gor kevneşpopîya cihûyan a berê tev gerîyane, yên heram didîtin jî li gor îctihada Rabban Gamliel ‘emel kirine.³⁷

Ev ayet di meala ku ji alîyê Fikrî Amedî ve hatîye amadekirin weha hatîye wergerandin: *“Ji ehlê kitêbê qismek hene, tu barên devan mal emanetî wan bikî, wê şûnde didin te. Lê hinek jî hene tu dînarekî bidî wan, heta tu li ser serê wan nesekînî, wî şûnde nadin te. Ji ber ku gotine di xwarina malê ummîyan (ereban/ nezenanan) de ji me re mesûliyet tune, loma (weha) ye. Evana bi zanebûn derewan li Xwedê dîkin.”*

Gelek mufesiran ev peyv wekî “ereban” şirove kirine.³⁸ Lê belê Maturîdî (w. 333/944) dibêje ku ev peyv, dikare bi du şiklan bê famkirin. Maneya ewil, meqsed jê “ereb” in. Lewra berî nizûla Qur’anê li ber destê ereban kitêbeke îlahî tune bû. Ew, jî vî alîyî ve dibin “ummî”. Maneya duduyan “misilman” in.³⁹ Ji ber ku ev gotin ji alîyê hin kesên Ehlê Kitab ve hatîye gotin, Zemexşerî dibêje ku ev, bi maneya kesên ku ne Ehlê Kitab in.⁴⁰

Di metnê Tosefta yê Îbrânî da ji bo kesên ku ne cihû ne, bi maneya kesê stêrperest îfadeya “oved kohavim” tê bikaranîn. Digel vê di şerî‘eta cihûyan da gelên ku ne cihû ne, mîna mîletên biyanî “goyim”, pûtperest “ovdey avoda zara” tên pênasekirin.⁴¹ Ji ber ku di ayetê da behsa helwesteke şaş a hin kesên ji Ehlê Kitabê kirin û ev peyv ji devê wan ji bo kesên ku ne ji wan in hatîye gotin, meriv dikare bibêje ku ev peyv wekî ayeta Alî Îmran 3/20an bi maneya wan kesan in ku kitêb ji wan ra nehatîye hinartin. Ev peyv jî vî alîyî ve ereban jî di xwe da dihevwîne. Lê belê gava meriv rasterast bibêje ereb an jî nezanan wê gavê di maneya kelîmeyê da bertengîyek peyda dibe. Ji ber ve yekê bi bawerîya me divê ku meriv vê ayetê weha wergerîne: *“Ji Ehlê Kitab kesên wisa hene ku tu bi baran zêran emanetî wan bikî çawa hildabin wisa li te vedigerînin. Hinekên wisa jî hene heke tu dînarekî bi emanetî bidî wan, heta ku tu li ser serê wan nesekînî wê li te venagerînin. Sedema wê ev e ku dibêjin: “Li hember ummîyan, tu berpirsariya me tune ye.” Ew bi zanebûn li Xwedê derewan dîkin.”* Anku peyva “ummîyan”ê di wergerê da bikar bîne û paşê jî wê li jêrenotê şirove bike.

37 Yasin Meral, “‘Leyse Aleynâ fi’l-Ümmiyyine Sebîl’ (Al-i İmran, 3:75)”, *Artuklu Akademi*, 1(2) 2014, 165-169.

38 Muqatil b. Suleyman, *Tefsîru Muqatil*, 1/285; Ebû Zekerîyya Yehya b. Ziyad el-Ferra, *Me‘anî l-Qur‘an*, ‘Alemlu’l-Kutub, Beyrût 1983, 1/224; Mawerdî, *en-Nuket we’l-Uyyûn*, 1/403.

39 Maturîdî, *Te‘wîlatu l-Qur‘an*, 2/343.

40 Zemexşerî, *el-Keşşaf*, 1/571.

41 Meral, “‘Leyse Aleynâ fi’l-Ümmiyyine Sebîl’”, 166.

Mînaka çar û pêncan: E‘raf 7/157-158

(الَّذِينَ يَتَّبِعُونَ الرَّسُولَ النَّبِيَّ الْأُمِّيَّ الَّذِي يَجِدُونَهُ مَكْنُوبًا عِنْدَهُمْ فِي السَّوَارَةِ وَالْإِنْجِيلِ يَأْمُرُهُمْ بِالْمَعْرُوفِ وَيَنْهَاهُمْ عَنِ الْمُنْكَرِ وَهُمْ فِي ظُلُمَاتٍ وَمُحَرَّمٍ عَلَيْهِمْ الْحَبَائِثُ وَيَضَعُ عَنْهُمْ إِصْرَهُمْ وَالْأَغْلَالَ الَّتِي كَانَتْ عَلَيْهِمْ ۚ فَاَلَّذِينَ آمَنُوا بِهِ وَعَزَّرُوهُ وَنَصَرُوهُ وَاتَّبَعُوا النُّورَ الَّذِي أُنْزِلَ مَعَهُ ۖ أُولَٰئِكَ هُمُ الْمُفْلِحُونَ قُلْ يَا أَيُّهَا النَّاسُ إِنِّي رَسُولُ اللَّهِ إِلَيْكُمْ جَمِيعًا الَّذِي لَهُ مُلْكُ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضِ لَا إِلَهَ إِلَّا هُوَ يُحْيِي وَيُمِيتُ فَأَمِنُوا بِاللَّهِ وَرَسُولِهِ النَّبِيِّ الْأُمِّيِّ الَّذِي يُؤْمِنُ بِاللَّهِ وَكَلِمَاتِهِ وَاتَّبِعُوهُ لَعَلَّكُمْ تَهْتَدُونَ)

Ev her du ayet ji alîyê Fîkrî Amedî ve weha hatine wergerandin: “*Ew didin pey wî nebiyê ummî ku, hatina wî di Tewrat û Încîla li cem wan de nivîsandîye. Ew (pêxember) emrî qencîyê dike û ji xerabîyê jî, men dike. Tiştên paqij helal u tiştên mirdar jî heram dike. Barên wan ên giran û qeyd û zincîrên wan radike. Ew ên bi wî bawerî anîne û piştgiriya wî kirine û ên hurmet û rûmet dane wî û ên dane pêy nûra ku jê re hatiye daxistin hene; ha ew ên xelas bûne ev in. Bibêje: Gelî mirovan! Ez pêxemberê Xwedê me ku ji we tevan re hatime şandin. Milkê erd û esmanan ê wî bi tenê ye. Ji wî pê ve îlah tune. Ew sax dike û dikuje. Werin bi Xwedê û qasidê wî, nebiyê ummî bawer bikin. Ew jî, bi Xwedê û gotina wî bawer dike. Bi wî bawer bikin ku hîn bigihîjin hîdayetê.*”

Piraniya mufesiran ev peyv bi awayê kesê nexwenda mane kirine. Anku Pêxemberê me, ne dikarî bixwenda ne jî binivîsanda.⁴² Li gor vê maneyê, kelfîme bi bal peyva “umm”ê yan jî “ummet”ê ve hatîye nisbetkirin.⁴³ Ebû ‘Ubeyde dibêje ku terkîba nebiyê ummî bi vê maneyê ye: Pêxemberê ku nikare bixwîne û binivîse.⁴⁴ Maturîdî ev peyv di çarçoveya ayeta ‘Enkebût 29/48an da şirove kirîye. Bi ya wî maneya vê îfadeyê: “*Berî vê, te ne kitêbek xwendibû*” (وَمَا كُنْتَ تَتْلُو مِنْ قَبْلِهِ مِنْ كِتَابٍ) ev e: Ne ku kitêbeke îlahî, te nedikarî tu kitêbek bixwenda. Sedema wê jî ew e da ku nebêjin, te ji kitêbên berê wergirtine. Herweha meqsed ji îfadeya: “*Ne jî te bi destê xwe nivîsibû*” (وَلَا تَخْطُهُ بِيَمِينِكَ) ev e: Te nedikarî binivîsanda. Heke na, dê bigotina ku te ji ber xwe ve nivîsandîye.⁴⁵ Bi bawerîya me divê ku meriv ayeta ‘Enkebût 29/48an di çarçoveya ayeta ‘Enkebût 29/47an û Şûra 42/52yan da şirove bike. Wê gavê dê derkeve holê ku her du ayet jî vê yekê destnîşan dikin: Berî nizûla Qur’anê agahîya Muhemmed aleyhiselam a di heqê kitêbên îlahî da tune bû. Çawa ku me li jorê di ayeta Alî Îmran 3/20 û 75an diyar kir kesekî weha bi tebîra Qur’anê “ummî” ye.

42 Muqatîl b. Suleyman, *Tefsîru Muqatîl*, 2/67; Teberî, *Cami’u l-Beyan*, 10/491; Zeccac, *Me’ani l-Qur’an*, 2/381.

43 Îbn ‘Etîyye Ebû Muhemmed ‘Ebdulheq b. Xalib, *el-Muherreru l-Wecîz fî Tefsîri l-Kitabi l-‘Ezîz*, thq. ‘Ebdusselam ‘Ebduşşafî Muhemmed, *Daru l-Kutubi l-‘İlmîyye*, Beyrût 2001, 4/62.

44 Ebû ‘Ubeyde, *Mecazu l-Qur’an*, 1/90.

45 Maturîdî, *Tê wilatu l-Qur’an*, 6/80.

Ji xeynî vê hem di ayeta En'am 6/9yan hem jî di ayeta Şûra 42/7an da ji bo bajarê Mekkeyê terkîba "ummu'l-qura"yê hatîye bikaranîn. Anku Mekke dayika, navenda niştewaran e. Lewra çawa ku di ayeta Alî Îmran 3/96an hatîye ragihandin, li ser rûyê dinyayê avahîya kamûyê ya ewil li wê derê hatîye avakirin. Ji ber vê yekê hin mufesiran weha gotine: Ji ber ku Muhemmed aleyhiselam ji Mekkeyê ye jê ra "ummî" hatîye gotin.⁴⁶ Li gor van agahîyan, tu eleqeya vê peyvê bi maneya kesê nexwenda ra tune ye.⁴⁷

Li alîyê din dîyar e ku peyva "el-ummî"yê, Muhemmed aleyhiselam nîşan dide. Ji vê îfadeya di ayetê da "wî di Tewrat û Încîla li cem da nivîsandî dibînin" (الَّذِي يَجِدُونَهُ مَكْتُوبًا عِنْدَهُمْ فِي التَّوْرَةِ وَالْإِنْجِيلِ) tê famkirin ku divê ew bi wesfê xwe yê "ummî" di van her du kitêban da bibore. Di Tewrat û Încîlê da bi maneya "nexwenda" wesfekî Pêxemberê me derbas nabe. Bereksî vê, di her du kitêban dinivîse ku nebîyê dawîn dê ji nesla Îsmâil aleyhiselam be û ji Mekkeyê be. Jixwe Muhemmed aleyhiselam ji nesla Îsmâil aleyhiselam e. Zarokên Îsraîl bi vê yekê dizanin.⁴⁸ Îfadeya di Tewratê da weha ye: "Ez dê ji nav birayên wan (zarokên Îsmâil), ji wan ra pêxemberekî bişînim. Hûn dê ji devê wî, gotinên min bibihîzin. Hemû tiştên ku ez jê ra ferman bikim dê bigihîne wan. Ez dê ceza bidim kesên ku guh nedin gotinên vî pêxemberê ku dê li ser navê min biaxive."⁴⁹ Di Încîlê da jî ev îfade hene: "Ez niha diçim ba yê ku ez şandime. Lê belê di nav we da tu kes jî ji min napirse û nabêje 'tu bi ku ve diçî?' Lê ji ber ku min ev ji we ra gotin, dilê we pê êşîya û hûn xemgîn bûn. Ez ji we ra rastîyê dibêjim, çûyîna min li xêra we ye û ji bo we baş e. Heke ez neçim, ji bo we Pareqlît nayê."⁵⁰ "Hîn gelek tiştên ku divê ez ji we ra bibêjim hene, lê hûn niha nikarin van ragirin. Lê belê dema ew anku Ruhê Rastîyê (Pareqlît) bê, dê berê we bide her rastîyê. Ew dê ji ber xwe ve neaxive, bes dê yên ku dibihîze bibêje û yên ku dê di siberrojê da biqewimin ji we ra ragihîne. Ew dê min berz û bilind bike."⁵¹

Ji ber ku di xebata navborî da ev kelîme bi çend şiklên cuda hatîye wergerandin, meriv tam serwext nabe bê ka gelo peyva "ummî"yê li vir bi çi maneyê hatîye bikaranîn. Bi qenaeta me divê li vir wekî "ummî" bê nivîsandin û paşê jî di çarçoveya agahîyên ku li jor hatin dayîn, bê şirovekirin.

46 Mawerdî, *en-Nuket we 'l-'Uyûn*, 2/268; Raxib el-Îsfahanî, *el-Mufredat*, 24.

47 Îbn 'Etîyye, *el-Muherreru 'l-Wecîz*, 4/62.

48 Tewrat/Tesnîye 18/18-19; Tewrat/Mezmûr 84/5-6; 118/22-26; Încîl/Metta 21/42-44; Încîl/Karûbarên Qasidan 3/21-23.

49 Tewrat/Tesnîye 18/18-19.

50 Încîl/Yûhenna 16/5-7.

51 Încîl/Yûhenna 16/12-15.

Mînaka Şeşan: Cumu’e 62/2

هُوَ الَّذِي بَعَثَ فِي الْأُمِّيِّينَ رَسُولًا مِنْهُمْ يَتْلُو عَلَيْهِمْ آيَاتِهِ وَيُزَكِّيهِمْ وَيُعَلِّمُهُمُ الْكِتَابَ وَالْحِكْمَةَ وَإِنْ كَانُوا مِنْ قَبْلُ لَفِي ضَلَالٍ مُبِينٍ

Ev ayet ji alîyê Amedî ve weha hatîye wergerandin: “*Ew ê ji nav ummiyan, ji wan re pêxemberekî ku ayetên wî dixwîne û wan paqij dike û kitêb û hikmetê nîşanî wan dide, ew e. Lê ew berê di nav xerîfî û şaşiyeke aşkera de bûn.*”

Piranîya mufesiran ev peyv weha tefsîr kirine: Ereben ku nedikarîn kitêban bixwînin û binivîsin.⁵² Ebû ‘Ubeyde bereksî tefsîra ayeta Alî Îmran 3/20an, li vê derê heman kelîme bi awayê kesên nexwenda şirove kirîye.⁵³ Li gor Zemexşerî, ev peyv bi bal kelîmeya “ummetu’l-ereb”ê ve hatîye nisbetkirin. Lewra bi miqayesekirina bi civakên din ra xwendin û nivîsandin di nav civaka ereban da tune bû. Li gor vê, ayet bi vê maneyê ye: Zilamekî “ummi” ji nav qewmekî “ummi” hatîye şandin.⁵⁴ Îbn ‘Etîyye (w. 541/1147) di heqê vê kelîmeyê da weha dibêje: Meqsed ji peyvê ereb in. Lewra peyva “ummi” bi vê maneyê ye: Kesê ku nikare bixwîne û binivîse. Hin kesan gotine ku ev kelîme îsmê mensûba terkîba “ummu’l-qura”yê ye ku tê maneya Mekkeyê. Lê belê li gor wî, ev nêrîn qels e. Lewra li gor vê, bi tenê Mekkeyî dibin “ummi”. Lê belê em dizanin ku meqsed jê temamê ereban e.⁵⁵

Li alîyê din Îbn Zeyd dibêje ku ev peyv, ji bo wan kesan tê gotin ku kitêbeke îlahî ji bo wan nehatîye hinartin. Ji ber vê yekê ye ku umeta Muhemmed aleyhiselam wekî “ummi” hatîye binavkirin.⁵⁶

Ya rast, pêxemberê ku berî Muhemmed aleyhiselam ji Mekkeyê ra hatîye şandin, Îsmâil aleyhiselam e. Li gor ku em ji ayetên Qur’anê fam dikin Xwedê jê ra kitêb nazil kirîye.⁵⁷ Lê belê dîyar e ku ew kitêb negihîştîye Mekkeyîyan û heta hatina Muhemmed aleyhiselam, nebîyekî din jî ji wan ra nehatîye şandin. Ji ber vê yekê di hin ayetan da ew wekî civakeke nehişyarkirî hatine hesibandin.⁵⁸ Herweha em dizanin ku Îbrahîm û Îsmâil aleyhiselam li Mekkeyê weha dia kirine: “*Rebbê me! Ji nav wan qasidekî ji bo wan wezîfedar bike, da ku ayetên te digel peywendîyên wan ji wan ra bixwîne, kitêb û hikmetê hînî wan bike û wan bi pêş bixe. Bêguman,*

52 Muqatil b. Suleyman, *Tefsîru Muqatil*, 4/325; Teberî, *Cami’u’l-Beyan*, 22/625; Zeccac, *Me’ani’l-Qur’an*, 5/169.

53 Ebû ‘Ubeyde, *Mecazu’l-Qur’an*, 2/262.

54 Zemexşerî, *el-Keşşaf*, 6/110.

55 Îbn ‘Etîyye, *el-Muherreru’l-Wecîz*, 8/300.

56 Teberî, *Cami’u’l-Beyan*, 22/626; Mawerdî, *en-Nuket we’l-Uyûn*, 6/5.

57 Ji bo vê yekê bnr: Beqere 2/136; Alî Îmran 3/84; En’am 6/83-89; Meryem 19/54.

58 Ji bo vê yekê bnr: Secde 32/3; Sebe’ 34/44; Yasîn 36/6.

*ê ku her dem ezîz e û hemû biryarên wî rast in, her tu yî!*⁵⁹ Yekane nebîyê ji nesla Îsmâîl aleyhiselam, Muhemmed aleyhiselam e. Hin ayetên din nîşan didin ku diayên Îbrahîm û Îsmâîl aleyhiselam hatine qebûlkin.⁶⁰

Ji ber ku kelîmeya “ummî”yê di vê xebatê da bi piranî wekî ereban, nezanan an jî muşrikên ereb hatîye wergerandin, meriv serwexta nabe bê ka gelo li vir bi çi maneyê hatîye bikaranîn. Ji ber vê yekê bi bawerîya me di çarçoveya agahîyên ku heta niha hatin dayîn, divê meriv ayetê bi vî şiklî wergerîne: “*Yê ku ji nav ummîyan (Mekkeyîyan) yek ji wan ra bi qasidî şandîye, Xwedê ye. Ew qasid, ji wan ra ayetên Xwedê digel peywendîyên wan dixwîne, wan bi pêş dixê, kitêb û hikmetê hînî wan dike. Lewra ew berê di nav rêşaxîyeke eşkere da bûn.*”

ENCAM

Çawa ku hat dîtin peyva “ummî”yê bi formên xwe yên cuda di wergera bi navê “Qur’ana Kerîm û Meala wê ya Kurdî” ya ku ji aliyê Fikrî Amedî ve hatîye amadekirin, weha hatîye wergerandin: “Ummî (nexwende) ne” (Beqere 2/78), “muşrikên nexwende” (Alî Îmran 3/20), “ummiyan (ereban/nezanan)” (Alî Îmran 3/75), “ummî” (E’raf 7/157-158) û “ummiyan” (Cumû’e 62/2).

Lê belê hem ji peywendîyên ayetan hem jî ji ayetên ku bi mijarê ra eleqedar in tê famkirin ku ev peyv di Qur’anê da bi van maneyan hatîye bikaranîn.

1. Kesê ku jê ra kitêbeke îlahî hatîye hinartin, lê belê bi naveroka wê nizane. Bi bawerîya me di ayeta Beqere 2/78an bi vê maneyê hatîye bikaranîn. Lewra di Qur’anê da ji bo yên ku li ber destê wan kitêbeke îlahî heye, du têgehên cuda tên bikaranîn: Ji van yek “ûtu’l-kitab” in (أَوْتُوا الْكِتَابَ). Ev, îfadeyeke giştî ye û bêyî ku li asta zanîna wan a di heqê kitêban da bê nêrîn, tevahîya wê civakê di xwe da dihevine.⁶¹ Ya din jî “ehlul’l-kitab” e. Ev têgeh, wan kesan îfade dike ku hay ji naveroka kitêbên xwe hene.⁶² Mesela di ayeta Beqere 2/79an da qala wan kesên ku hay ji naveroka kitêbên xwe hene hatîye kirin û ferqa di navbera wan da û yên ku di ayeta 78an da behsa wan tê kirin bi awayekî zelal hatîye bilêvkin.

2. Kesê ku jê ra kitêbeke îlahî nehatîye hinartin. Mesela di ayeta Alî Îmran 3/20an da xîtab li du koman hatîye kirin. Yek jê kesên “ûtu’l-kitab” in. Anku kesên ku ji bo wan kitêbeke îlahî hatîye hinartin. Ya din jî “el-ummîyyîne”yê (الْأُمِّيَّيْنَ) ne. Li gor vê divê ku ew komeke miqabilî koma ewil bin.

59 Beqere 2/129.

60 Ji bo vê yekê bnr: Beqere 2/151; Alî Îmran 3/164; Tewbe 9/128.

61 Ji bo vê yekê bnr: Nîsa 4/47, 131; Maîde 5/5.

62 Ji bo vê yekê bnr: Beqere 2/109; Alî Îmran 3/70-71, 98-99; Nîsa 4/171; Maîde 5/15.

3. Kes an jî kesên ji Mekkeyê. Di ayetên E‘raf 7/157-158an da ji Muhemmed aleyhiselam “ummî” hatîye gotin. Di her duyan da jî mixatab cihû û xiristîyan in. Li aliyê din ayetên Şûra 42/52-53; ‘Enkebût 29/47-48an sedema ummîbûna Muhemmed aleyhiselam û hemû Mekkeyîyan eşkere dike. Lewra Pêxemberê me berî daketina Qur’anê, zanîna wî ya di heqê kitêbên îlahî da tune bû. Lê ne ji ber vê yekê jê ra “ummî” hatîye gotin. Ji ber ku di Tewrat û Încîlê da hatîye destnîşankirin ku pêxemberê dawî dê ji zuryeta Îsmâil aleyhiselam be û ji Mekkeyê derkeve, gava peyva “ummî”yê di Qur’anê da di heqê wî da bê bikaranîn, tê maneya kesê ji Mekkeyê. Meriv dikare bibêje ku bi vê maneyê ev peyv di ayetên Alî Îmran 3/75 û Cumu‘e 62/2yan da di forma pirhejmarîyê da ji bo Mekkeyîyan hatîye bikaranîn.

ÇAVKANÎ

- Ebû ‘Ubeyde, *Mecazu’l-Qur’an*, thq. Fuat Sezgin, Mektebetu’l-Xancî, Qahire.
- Ezherî, Ebû Mensûr Muhemmed bin Ehmed, *Tehzîbu’l-Luxe*, thq. Ebdulhelîm en-Neccar, ed-Daru’l-Misrîyye li’l-Te’lif we’t-Terceme, Qahire 1964.
- Ferra, Ebû Zekerîyya Yehya b. Zîyad, *Me‘ani’l-Qur’an*, ‘Alemu’l-Kutub, Beyrût 1983.
- Îbn ‘Etîyye, Ebû Muhemmed ‘Ebdulheq b. Xalib, *el-Muherreru’l-Wecîz fî Tefsîri’l-Kitabi’l-‘Ezîz*, thq. ‘Ebdusselam ‘Ebduşşafî Muhemmed, Daru’l-Kutubi’l-‘Îlmîyye, Beyrût 2001.
- Îbn Dureyd, *Cemheretu’l-Luxe*, thq. Remzî Munîr Be‘lebekkî, Daru’l-‘Îlmi li’l-Melayîn, Beyrût 1987.
- Îbn Faris, *Mu‘cemu Meqayîsi’l-Luxe*, thq. ‘Ebdusselam Muhemmed Harûn, Daru’l-Fikir, 1979.
- Îbn Quteybe, *Tefsîru Xerîbi’l-Qur’an*, thq. es-Seyyid Ehmed Seqer, Daru’l-Kutubi’l-‘Îlmîyye, Beyrût 1389/1978.
- Îbn Teymîyye, Ebu’l-‘Ebbas Teqîyuddîn Ehmed b. ‘Ebdulhelîm el-Herranî, *Deqaiqu’t-Tefsîr*, Muessesetu ‘Ulûmî’l-Qur’an, Dimeşq 1404/1984.
- Maturîdî, *Te’wîlatu’l-Qur’an*, thq. Ahmet Vanlıoğlu - Bekir Topaloğlu, Mizan Yayınevi İstanbul 2010.

- Mawerdî, Ebu'l-Hesen 'Elî b. Muhammed b. Hebib el-Besrî, *en-Nuket we'l-'Uyûn*, thq. Seyyid b. 'Ebdulmeqsûd b. 'Ebdurrehîm, Daru'l-Kutubi'l-'İlmîyye - Muessesetu'l-Kutubi's-Seqaffiyye Beyrût.
- Meral, Yasin, “‘Leyse Aleynâ fi'l-Ümmiyyîne Sebîl’ (Al-i İmran, 3:75)”, *Artuklu Akademi*, 1(2) 2014, 165-169.
- Muqatil b. Suleyman, *Tefsîru Muqatil*, thq. 'Ebdullah Mehmûd Şehhate, Muesseset't-Tarîxi'l-'Erebî, Beyrût 2002.
- Pekim, Mehmet Tahir, *Kürtçe Tefsir ve Meâl Çalışmaları (Nûra Qelban Örneği)*, ed. Lokman Şan, Weşanên Fecrê, Stenbol 2023.
- Qur'ana Kerîm û Meala wê ya Kurdî*, wergêr: Fikrî Amedî, Weşanên Ensar Neşriyat, Stenbol 2014.
- Raxib el-İsfahanî, *el-Mufredat fi Xerîbi'l-Qur'an*, thq. Muhammed Seyyid Keylanî, Daru'l-Me'rife Beyrût.
- Sahib b. 'Ebbad, *el-Muhît fi'l-Luxe*, thq. Muhammed Hesen Al Yasîn, 'Alemu'l-Kutub, Beyrût 1994.
- Teberî, Ebû Ce'fer Muhammed bin Cerîr, *Cami'u'l-Beyan 'en Te'wîli Ayi'l-Qur'an*, thq. 'Ebdullah bin 'Ebdulmuhsin et-Turkî, Merkezu'l-Buhûs we'd-Dirasati'l-'Erebîyye we'l-İslamîyye Daru Hecr, Qahire 2001.
- Xelîl bin Ehmed el-Ferahîdî, *Kitabu'l-'Eyn*, thq. 'Ebdulhemîd Hindawî, Daru'l-Kutubi'l-'İlmîyye, Beyrût 2003.
- Zeccac, Ebû İshaq İbrahîm es-Serî, *Me'ani'l-Qur'an we Î'rabuhu*, thq. 'Ebdulcelîl 'Ebduh Şelebî, 'Alemu'l-Kutub, Beyrût 1988.
- Zemexşerî, Mehmûd bin 'Umer, *el-Keşşaf 'en Heqaiqi Xewamidi't-Tenzîl we 'Uyûnu'l-Eqawîl fi Wucûhi't-Te'wîl*, thq. eş-Şeyx 'Adil Ehmed Ebdulmewcûd - eş-Şeyh 'Elî Muhammed Mu'ewwed, Mektebetu'l-'Ubeykan, Rîyad 1998.